**xwebûn**

5 - 11 Hezîran 2023 / e-mail: rojname@xwebun.org / Hejmar: 181

**İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:** Kadri Esen
**Sorumlu Yazıişleri Müdürü:** Mehmet Ali Ertaş
**Yayın Danışma Kurulu:** Abdulla Peşêw
Adar Gulan
Heval Dilbihar
Ehmed Huseynî
Kakşar Oremar
Selîm Temo
Dr. Zerdeşt Haco
Munewer Azîzoglu Bazan

**Yayın Türü:** Haftalık Yaygın Süreli
**Yönetim Yeri:** Fırat mahallesi 499/1. SK
100 Evler Sitesi No: 6 F **Kayapınar/ Diyarbakır**
**Baskı:** Dicle Basın Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti
Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Blv. Batıkent
Yapı Koop. 26/UA **Bağlar / Diyarbakır**

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsyar e.*

**Ji bo abonetiyê**
**Tel:** 0 (541) 806 84 85



Dr. İsmet Konak

# Kurdistano Sûrex



Çarîya Rûsya de serra 1917î de di şorişî qewimîyayî. Verî Şorişê Sibate bî. Nê şorişî de sinifê burjuwazî îqtîdar girewt destê xo. Labelê panbîyayoxan îqtîdarê burjuwazî qebul nêkerd. Çike persê înan ê serekeyî nêameyî çareserkerdene. Ne persa nanî ne aştîye ne zî persê bînî yê sinifkî çareser nêbîyî. Eksê ci burjuwazîyî şerê dinya rê dewam kerd. Girseyê şarî hewcedarê aramîye û azadîye bîyî. Nê semedî ra vera burjuwazî têkoşînî hewce kerd. Binê serkêşîya şorişgêrê bolşevîkî V.Î. Lenînî de têkoşîn xurt bî. Bi vatişê Mao Zedongî sereyê rime ame hemverê burjuwazî qanalîzekerdene. 25ê teşrîna verêna 1917î de Rûsya de şorişo sosyalîst qewimîya. Nê şorişî de persa kêmneteweyîyan xeylê baş formule bîye. Na çarçewa de 15ê teşrîna peyêna 1917î de Deklarasyonê Heqanê Şaranê Rûsya amebî îlankerdene. Goreyê nê deklarasyonî şarê Rûsya wayîrê heqê dîyarkerdişê ameyoxê xo bîyî. Bi nê hawayî îdareyê Sovyetan baxusus serranê 1920an de seba kêmneteweyîyanê cîyayan otonomîyî awan kerdî.

Kurdî zî no wext hemwelatîyê Yewîya Sovyetan bîyî. Ê zafane komaranê Gurcistan, Armenistan û Azerbaycanî de ciwîyêne. Nê konteksî de goreyê hûmaritişê nufusî yê 1926î Yewîya Sovyetan de teqrîben 70 hezar kurdî ciwîyêne. Zafêrîyêka girde ya nufusî rojawanê Azerbaycanî de zerreyê Daglik Karabagî de mendêne.

**Cengîz Yildirim**

Yewîya Sovyetan de serra 1921î de vêşanîya girde qewimîyaye. Vêşanîye kurdê ke Daglik Karabag de ciwîyêne ser o tesîrêko nebîyaye kerd. No wext hukmatê Azerbaycanî de wezîrêko kurd estbî. Nameyê ci Cengîz Yildirim bî. Yildirim persa vêşanîye de xeylê eleqedar bî û herêma kurdan sey "herêma vêşanîye" îlankerdbî. Ey na perse 6ê gulana 1921î de Kongreya Sovyetanê I. ya Azerbaycanî de ardbî rojdem. Kongre zî herêma kurdan sey "herêma vêşanîye" nas kerde. Na kongre de babetê sey sivikkerdişê vêşanîye û awankerdişê Kurdistanî ameyî nîqaşkerdene.

**Telgrafê Belubekovî**

Kongre ra dima babeta Kurdistanî hîna zaf ameye qiseykerdene. 3ê teşrîna verêna 1921î de kurdanê rayonê Koturlînî Komîteya Merkezî ya Partîya Komunîste ya Azerbaycanî rê telgrafêk şawit. Muhtewaya telgrafî bi kilmî wina ya: "Ma kurdê ke rayonê Koturlînî yê xeylê sixletî temsîl kenê yê. Ma tewrê mîtîngî bîyî, pêşkêşê rayîrheval Belubekovî yo bi nameyê 'Kurdistano Sûrex û Rewşa ey a Nikayêne' goşdarî kerd û mabênê xo de qeraro winayên girewt: Ma kurdî azad ê û hetê xoza ra îqtîdarê Sovyetan ra nêzdî yê." No telgraf hoka pênaskerdişê herêma kurdan ra deyra balkêş o. Çike Belubekov pênaşkerdişê "Kurdistano Sûrex" şuxilneno. No ramojneno ke mîyanê bolşevîkan de derheqê çekuya Kurdistanî de vîro tarîxî esto. Na çarçewa de çimeyêk xeylê girîng o. Doktor û gêrayoxo îskoç John Bellî serranê 1715-1718an de Îranî rê raywanîyêke kerde. Bell nuseno ke farsîyan herêma kurdan sey "Kurdistan" pênas kerdo. Beno ke no namekerdiş demê vîyarteyî ra derbasê wextê bolşevîkan bîyo.

**Telgrafê Nerîmanovî**

14ê teşrîna peyêna 1921î de serekê hukmatê Azerbaycanî Nerîman Nerîmanovî Lenînî rê telgrafêk şawit. Nerîmanovî dîyar kerd ke hukmatê ci seba Volga û Kurdistanî do 40 mîlyon ruble hetkarîye bişirawo. Lenînî gama hukmatî ecîbnaye û îfade kerd ke semedê enternasyonelê sûrexî na game zaf muhîm a.

Kurdistano Sûrex 16ê temmuza 1923yî de ame awankerdene. Serra 1929î de netîceya entrîkayan de rijîya. Tarîxê ey hema zî mîyanê kurdan de xeylê balkêş o



**Kurdistano Sûrex**

Badê cû babeta roniyayîşê Kurdistanî çend reyî ameye nîqaşkerdene. Netîce de 7ê temmuza 1923yî de rojawanê Daglik Karabagî de derheqê awankerdişê Kurdistanê otonomî de bire dîyaye. Dima Komîteya Merkezî ya Rayberdişî ya Partîya Komunîste ya Azerbaycanî 16ê temmuza 1923yî de Kurdistano Sûrex îlan kerd. Rûskî de sey "Kurdistanskîy Uyezd (Курдистанский уезд)" zanîyêne.

**Sînor û nufusê Kurdistanî**

Kurdistanê Sûrexî de komîteyêke virazîyaye. Sereyê komîte de sîyasetmedaro bolşevîk Gusî Hacîyev estbî. Paytextê herême verî dewa Pîrçahanî bî. Bado Laçîn ame paytext kerdene. Serranê verênan de xerza Laçînî bajarê sey Gubatli/Kubatli, Kelbecer, Zengîlan girêdayîyê Kurdistanê Sûrexî bîyî. Derheqê nufusê herême de tayê çimeyî estê. Nê konteksti de raywanîyêka etnograf G.F. Çursînî bale anjena. Çursîn serra 1924î de şî Kurdistan. Dewa Mînkendî ra Samed Şahsuvarovî ci rê rayîrhevalîye kerdbî. Çursîn nuseno ke orîjînê kurdanê na herême deyaxê şerî yo ke serra 1589î de mabênê dewleta Osmanî û Safevîyan de qewimîyabî beno. Goreyê hîpotezê ey kurdê nikayênî yê herême tornê kurdanê ke tewrê nê şerî bîyî yê. Etnograf Çursîn dîyar keno ke Kurdistanê Sûrexî de hema-hema 44 hezar merdim ciwîyêne. Mîyanê nînan de 35 hezar kurdî estê. Derheqê nufusê herêma otonomî de dayeyo bîn esto. Goreyê hûmaritişê nufusî yê 1926î Kurdistanê Sûrexî de 51 hezar 442 kes ciwîyêne. Hûmara kurdan 37 hezar 470 bîye.

**Kurdistan de mêşwanîye**

Herêma Kurdistanî de îtîqat û ziwanî zî bala cigêrayoxan antbî. Çursîn nuseno ke kurdê îtayî şiî bîyî û înan kurmancî qisey kerdêne. Kurdan heman wextî de tirkîya Azerbaycanî zanayêne. Şarê Kurdistanê Sûrexî debara xo zafane heywanîye û citkarîye reyde kerdêne. Bitaybetî mêşwanîye zaf vilabîyaye bîye. Hema-hema her dewe de pêtagî estbî.

**Peynîya Kurdistanê Sûrexî**

Emrê Kurdistanê Sûrexî çi heyf ke zêde nêbî. 8ê nîsana 1929î de bi destê Kongreya VI. ya Sovyetanê Azerbaycanî Herêma Kurdistanî wedarîyaye. Sebebê wedarîyayîşê herême bi serrano yenê nîqaşkerdene. Ma tayê hîpotezan û çimeyan rê nîya bidê. Cigêrayoxo armenî Davîd Babayan pare keno ke wedarîyayîşê otonomîya kurdan stratejîya îdareyê Azerbaycanî bî. Goreyê fikrê Babayanî îqtîdarê Azerbaycanî nêwaşt kurdî wayîrê hişmendîya neteweyîye bibê. Ey waşt kurdan mîyanê nufusê muslumanan de bihelîno. Na çarçewa de raywanîya cigêrayoxo A.V. Gurko-Kryajînî xeylê balkêş a. Çimdarîyê ey serra 1929î de rojnameyê Zarya Vostoka de weşanîyayî. Gurko-Kryajîn nuseno ke herême de serranê peyênan nufusê tirkanê Azerbaycanî zêdîya. O fikrîyeno ke no zêdebîyayîş mekanîk nêbî. Armanc "tirkkerdiş" û asîmîlasyono kulturî bî.

**Têkilîyê Tirkîya û Rûsya**

Fikrîyeno ke peynîya Kurdistanê Sûrexî de têkilîyê ke mabênê Tirkîya û Yewîya Sovyetan de roniyayî xeylê tesîrdar bîyî. Yeno zanayene ke 16ê adara 1921î de mabênê Tirkîya û Rûsya de Peymana Moskova îmze bîye. Goreyê maddeya 8. ya na peymane wird hetî do zerre û teber de elementê ke înan rê gefî wanenê rê paştî medê. Bi nê hawayî gama ke Xoverdayîşê Şêx Seîdî qewimîyabî, hetê Yewîya Sovyetan ra tu paştîdayîşêk nêşî. Tewr zîyade îdareyê Moskova xoverdayîş sey xoverdayîşo feodal û hemver-şorişgêr hesibna. Mîyanê wird dewletan de 17ê kanûna 1925î de peymanêka bîne ameye îmzekerdene. Goreye na peymane eke hêzêk hêrişê vera nê dewletan ra yewî bikero, o wext wird dewletî do bêhet bibê. Dima ra di dewletan têkilîyê xo xorîn kerdî. 11ê adara 1927î de mabênê di dewletan de peymanêka bazirganî îmze bîye. Goreyê na peymane 7 şaristananê (Stenbol, Îzmîr, Trabzon, Mêrsîn, Erzîrom, Konya, Eskîşehîr) Tirkîya de temsîlkarîyê bazirganî ameyî akerdene. Bêguman na peymane seba Yewîya Sovyetan wayîrê girîngîyêka girde bîye. Çike seba îdareyê Moskova "çarçîbaya" ke tede bîne ameyêne girewtene bîye.

**Nuşteyê Şukru Kayayî**

Hukmatê tirkî bitaybetî Peymana 1927î seba menfaetanê xo şuxilnabî. Ma texmîn kenê ke Kurdistano Sûrex tedaya îdareyê Anqara reyde rijîya. No dem Azerbaycan de nameyê Mîr Cafer Bagîrovî xeylê balkêş bî. Bagîrovî îstîxbaratê Azerbaycanî îdare kerdêne. Fikrîyeno ke Bagîrovî vera kurdan polîtîkaya "azerbaycanijkerdişî" rayra berda. Na çarçewa de menfaetê îdareyê Anqara û hukmatê Azerbaycanî yew bîyî. Vera destkewteyanê kurdanê Kafkasya nêrazîbîyayîşê hukmatê tirkî ser o tayê çimeyî estê. Mîsal belgeyêkê bi tarîxê 19ê çeleyê 1935î de ma vînenê ke Wezîrê Karanê Zerreyî Şukru Kayayî Sersefîrê Tirkîya yê Moskova Huseyîn Vasif Çinarî rê nuşteyêk şirawito. Nê nuşteyî de wina aseno ke Şukru Kayayî bi maslahatguzarê Yewîya Sovyetan ê Anqara derheqê rewşa kurdan de qisey kerdo. Kayayî vato ke ê nêeşkenê kurdanê Yewîya Sovyetan sey "kêmneteweyîye" bihesibnê. Yew zî dîyar kerdo ke eke Yewîya Sovyetan wareyê ziwan û kulturî de heqanê kurdan dana, înan rê otonomî virazena no teberkîyê "peymanêke" beno. Wina aseno ke Wezîr Şukru Kaya qala Peymana 1927î keno. Wezîro tirk peymane sey hacetî şuxilneno. Belge de dîyar beno ke îdareyê Anqara de "kurdofobîyo" gird esto. Qiseykerdişê Şukru Kayayî ra 2 serrî tepîya rojname Rêya Teze ame qefilnayene. Tayê wendegehê kurdan padîyayî. Oncîna çend roşnvîrê kurdî tepişîyayî. Destê Tirkîya nê serebûtan de esto yan çin o, zêde nêzanîyeno. Derheqê na babete de delîlê şenberî çin ê. Labelê xeylê dewleta tirke amebî ca.



## Têkoşîna verva faşîzmî

Tirkîya hefteyê over yew vecînitişê dîroke viraşt. Eno vecînitişan di dîroke biki, yew kinar ra têkoşîna verva faşîzmî, kinaro bîn ra temamkerdina îxtîdarê faşîzmî rê sehne bî. Erdoganî hîle, reydi serkoytina xu îlan kerde... ***Mahîr Uzmez / R.9***



## Şaristanîya mirovî

Mirovahî beşdarî du pêvajoyên gerstêrk ên hevdemî yên domdar dibe; pêşketina biyolojîkî ya gerdûnî ku li ser gerstêrka me bi qasî 3-4 mîlyar sal pêk tê û pêşketina sosyo-çandî ya şaristaniya mirovî ku bi qasî... ***Kurdistan Lezgiyeva / R.6***



## Hêza raman û baweriyê

Behre û gewhera ku mirov ji heyberên din vediqetîne raman e. Raman behreya hiş e. Hiş berhema mejî ye. Lewre heyberê ku behreya ramîn/fikirîn û baweriyê pê re peyda dibe, tenê mirov e. Raman hem behreya famkirina... ***Adar Jiyan / R.5***


# xwebûn

5 - 11 Hezîran 2023 Hejmar: 181 Buha: 7.5 TL rojname@xwebun.org


## Siyaseta Xerabe

Di civaka kurdan de partiyên siyasî xwe ji çand û neteweyê girîngtir dihesibînin. Li gorî wan, divê milet ji bo partiyê be, ne partî ji bo milet. Di kurdan de partî armanc in, û ziman û çand alav in; ango ziman û çand dikarin ji bo partiyekê bên şikenandin, xerckirin û xerakirin. Di civaka kurdan de hemû partî –rastgir an jî çepgir qet ferq nake– îdeolojiya xwe ji milet û welat hêjatir dihesibînin. Şerîet, sosyalîzm ya jî lîberalîzm, vana ji miletê kurd pêştir in, divê dewleteke bi navê Kurdistanê ji bo van îdeolojiyan ava bibe ku ew karibin lê baştir bijîn, karibin tê de vegevizin... ***Rênas Jiyan / R.8***



# ‘Têkoşîna jinan niha dest pê dike’

Parlamentera berê ya HDP’ê Feleknas Ûca der barê xebatên jinan û têkoşîna jinan de got ku jin li dijî rehîngirtina di malê de û bêvînhiştinê bersiva xwe bi têkoşînê bidin û wiha axivî: “Li dijî êrîşên desthilatê dê jin jî parastina destkeftiyên xwe bikin. Jin ji bo parastina destkeftiyên xwe bi salan e têdikoşin. Gotina ‘Jin jiyan azadî’ ji bo jinên kurd ne tenê dirûşmeke . Ev peyv bû felsefeya jinên azad. Em karin bibêjin ‘Jin jiyan azadî’ ji bo hemû jinan bû felsefeyeke navneteweyî. Ûca bi bîr xist ku kesên ku destdirêjiyê li jin û zarokan dikin nayên cezakirin û wiha pêde çû: “Ev bûyer ji ber desthilatiya AKP-MHP’ê diqewimîn. Ev tifaqa dijminê azadiya jinan wê mudaxaleyî azadiya zarokan jî bike. Ev tifaq ne bi ferqeke mezin bi ser ket. Em bêjin gelên li vî welatî dijîn ji sedî 48 li dijî van biryarên wan in. Ku em bi têkoşîneke mezin li ber xwe bidin em ê karibin pêşiya zîhniyeta wan bigirin. Her kesek divê biryara xwe di vê qonaxa nû bide û xeteke têkoşînê ava bike...

## Serdema nû ya têkoşînê

Li bakurê Kurdistanê û Tirkiyeyê hilbijaratinên parlamentoyê û serokkomariyê di rewşeke awarte de pêk hatin. Ev hilbijartina ku ji gelek derdoran ve dîrokî dihate dîtin, di bin siya erdheja ku navenda wê navçeyên Bazarcix û Elbistan ên Meraşê de bû pêk hat. Bê guman piştî trajediya erdhejê bi çend mehan pêkanîna hilbijartineke wisa stratejîk ji bo partiyên siyasî û gel ne hesan bû. Desthilata AKP-MHP’ê ji roja destpêkê ve ket nava hewldanên ku vê rewşê çawa li gorî berjewendiyên xwe bi kar bîne. Hilbijartinên 14 û 28’ê gulanê di rewşeke wisa giran de pêk hatin... ***Felemez Ulug / R.6***

# Tecrîd li dijî hebûna kurdan e

Xwişka Veysî Aktaş Sabîha Asla ku ji sala 2015’an ve li gel Rêberê PKK’ê Abdullah Ocalan tê girtin, bertek nîşanî tecrîda li Îmraliyê tê meşandin da û got ku tecrîd li dijî hebûna gelê kurd e

Li Girava Îmraliyê tecrîdeke giran li ser Rêberê PKK’ê Abdullah Ocalan û girtiyên li cem wî Omer Hayrî Konar, Hamîlî Yildirim û Weysî Aktaş tê sepandin û 14 meh in agahî ji Ocalan û girtiyên li cem nayên girtin. Desthilata AKP-MHP’ê bi hinceta “cezayê disîplînê” bi daraza tirk hevdîtinên parêzeran û malbatan ên ji bo Îmraliyê qedexe dike. Malbata girtî Veysî Aktaş, der barê tecrîda ku li Îmraliyê tê meşandin ji rojnameya me re axivî. Xwîşka Aktaş Sabîha Aslan, destnîşan kir ku bi tecrîdê tunekirina çand, ziman, dîrok û hebûna gelê kurd tê armancakirin û got ku wê heta dawiyê li dijî vê armancê li ber xwe bidin û wiha got: “Beriya ku tecrîd giran bibe di nava 8 salan de nedihiştin em zêde biçin Îmraliyê. Ji roja ku ew birine Îmraliyê heta niha ne bi nameyê, ne bi telefonê, ne jî bi hevdîtinê me xweşik ji wan agahî negirtiye. Her cara ku em diçûn hevdîtinê hem çûna me hem jî vegerandina me bi xemgînî bû. Hevdîtina ku bi awayekî hiqûqî mafê me bû jî li me diherimandin.” ***R.7***



## Rewşenbîrê dilnizim

Bê guman dema behsa helbesta nûjen û bi taybetî ya rojavayê Kurdistanê tê kirin yekser û di rêza yekemîn de navê Ehmedê Huseynî tê bîra mirov. Ehmedê Huseynî pira di navbera 2 nifşan de bû û heta mirov dikare bêje pira di navbera çend nifşan de ye. Ji ber ku Huseynî bi çend nifşên xwe û yên li pey xwe re jiya û niha jî bi nifşekî din ê ciwan ê nûhatî yên xwedî azmûneke nû re dijî. Gelek helbestkarên ji nifşê Ehmedê Huseynî riya helbesta bi qafiyê ya klasîk dewam kirin lê Ehmed li hespê nûjeniyê siwar bû û wekî siwarekî çargurçik hefsar ji hespa xwe ya kihêl re berda...
***Rizoyê Xerzî / R.5***

## Îtîfaqê çar û sultanî

Rejîmê Putînî heta weçînayîşanê parlamenterî û serekkomarîye hukmatê Erdoganî fînanse kerd. Destûr nêda ke krîzê ekonomîkî xorîn bibo. Bêguman Putînî nê gamî seba hezkerdişê Erdoganî nêeştî. Yew xo sey çarî hesibneno, o bîn xeyalê “sultanîye” keno. Tarîxê nê di dewletan de çarî qet sultanî ra hez nêkerdbî. Eksê ci mabênê înan de Kafkasya, Deryayê Sipî û Anatolîya ser o xeylêk şerê gonînî qewimîyayî. Ewro zî îdare û îdarekaranê nê dewletan de hişmendîya winayêne yanî hişmendîya îşxalkere û zordeste esta. Putîn û Erdogan manenê dileteyanê Sîyamî. Emelîyet zî bêro kerdene, nê dileteyî yewbînî ra nêne abirnayene... ***R.9***

FEYZÎ MÎRHESEN

Gur, rovî û şivan R.10

## Xewn û mîrateya malbatî

Nivîskarê mêvan ê rojnameya me Kurdyar Dirê`î li ser têkiliya AKP-MHP û PDK’ê û girtina deriyê Sêmalka rawestiya. Dirê’î, diyar kir PDK di aliyê aborî, siyasî, çandî û kesayetî de yekser ketiye bin serweriya AKP-MHP’ê li gorî berjewendiyên Tirkiyeyê tevdigere û wiha got: “PDK jî weke Tirkiyeyê piştgiriya dijberên Sûriyeyê kir û zihniyeta îslamê daniye pêşiya xwe û li dijî Rojava propagandaya reşkirinê dike; li ser daxwaza Tirkiyeyê ENKS’ê dixe nava liv û tevgerê. Her çiqasî ne rasterast be jî weke Tirkiyeyê li dijî Tevgera Azadiyê serî li planên qirêj dide. Lewra girtina deriyê Sêmalka berdewamiya siyaseta PDK’ê ya bi Tirkiyê re ye. Di wir de ENKS derbas dike, ger ku ne ji Amerîkayê bûya dê ji mêj ve deriyê Sêmalka girtibûya” ***R.4***



## Hekîmên ATK’ê bûne endamê AKP’ê

Parêzer Bunyamîn Şeker, diyar kir ku rewşa girtiyên nexweş hatiye asta ehlaqî û wijdanî. Şeker, got ku ATK weke saziyeke xweser tevnagere û heyetên ku ji hekîman ava bûne weke enstrumanên deshilatê dixebitin. Divê ATK bibe saziyeke serbixwe.” ***R.3***

## Ma Masic gundê muzîkê ava dike

Koordînatorê Ma Musicê Şêrko Kanîwar, diyar kir ku bi Rojên Muzîkê armanca dikin ku bêtir zarokên kurdan ji qirkirina çandî xilas bikin û got ku ger derfetên wan guncav bibin, wê li Amedê gundekî muzîkê ava bikin.” ***R.11***

## Golik

Golik, yanî çi? Di civaka me kurdan de yên ku karê gundewarî kirine dizanin û gotineke pêşiya heye ¨golikek garanekê xira dike¨ Çima xira dike, çawa xira dike ku ev nêrîn an jî şîrove her cihî li ser golikan tê gotin. An jî di nava cîvakê de ji kesekî nesekinî, tiştan tev li hev bike, çep û rast rihetiya civakê xira bike re jî dibêjin ¨weke golikan e, di cihê xwe de nasekine¨ Baş e golik çawa tevdigere, garan hejmareke çêlek, nogin, ga, conege, hesp-canî û keran pêk tê. Eger şivan zîrek nebe, garanê bê ser û ber çolê belav bibe. Golik, her tiştî meraq dike, fêm bike, fêm neke, bizane yan jî nezanî xwe dike her kendalî, gur û kuçik, rovî hev dernaxe, ji ber vê xwediyên golikan heya golik nebe du salî her li ser wê û goloktiya wê baldar in... ***Aramê Elegezê / R.8***